**Gotina serokê komara Fidral (Bundespräsident) Frank-Walter Steinmeier**
**bi Video piştî zemînheja malwêran li Tirkiyê û Sûriyê li 09.ê Sibata 2023 an li Koçka Bellevue /Schloss Bellevue**

Ji roja dişemêve wêneyên pirxem ji Tirkiyê û Sûriyê digihêjne me. Zemînheja pirbihêz bajarên sax û bitevayî wêran kirin û kavil hiştin. Bêtir ji 17.000 kesî heta niha jiyana xwe jidestdane, bi dehêhezaran kes birîndar bûne, zilam, jin û zarok dinav livînên xwede di xewa şîrînde bûn, dema zemînheja malwêran biser wanda hat. Hêjî gelek ji wan dibin warade û kavilên xaniyên hilweşiyaîde man e. Geleka werê xwe, heyî û tuneya xwe windakirin û bêparastin liber berf û sermê man e. Dimhijmêr bi demhijmêr, hijmara qurbaniyan bêtir dibe.

Em dibînin çewa kesê saxmane xemgînin lisewr kes û merivên xwe, şîna dêyan, bavan, kuran, keçan, biran û xwişkan dikin. Em dibînin, go gelek kes – tenê bidestê xwe, ax û xwelî û zixuran dikolên û dinav de rêvedikin û li kesê xweyî şêrîn liber dile xwe digerin. Em ji dûrve wênene pir bi êş û dramtîk dibînin û bi me gelek zehmete vê êşê hilbigrin: Bavek destê keça xweye mirî digre û naxwazê destê wê ji destê berde.

Ez divêm îro berê xwe bidme gelek mirovên li Almanya dijîn û meriv û hevalên wan li Tirkiyê û Sûriyê hene. Berê xwe bidim gelekan, ên go li hemû deverên Komarê dijîn, xemgînin û şînê dikin, digrîn, hêvîdikin û çavlirêne; hest bi bêçareyiyê dikin, jiber nikarin bidestê xwe li devera malwêranî biserde hatî arîkarbin.

Ez spasî wan kesan dikim, ê go van rojan arîkariyê dikin, çi li vir dibe, çi jî li wan bajarên kavilbûyî dibe. Ew gelek kesin, ê go bêwestandin xebatê dikin; barê arîkariye birêdikin, arîkariyê komdikin û bixwe jî arîkariyê didin; go arîkariya dirawsê û cîranên xwe dikin, ê go ev malwêranî biser mervên wan ve li Tirkiyê û Sûriyê hatiye. Ez binavê welatê me ji dil spasiya we dikim: teşekkürler, spas und shukran!

Mîraz aû xatûnên hêja, niha û vêga, arîkariya me ji wan kesan re pêwîste, ê go zemînhejê hertiştê wan ji wan stand. Piştgirî û arîkariya me wê ji wan re pêwîstbe, go wênê malwêraniyê liberçava nemînin û dengûbasne dine girin cihê wan bigrin. Pêwîstî bi mirovahiya me heye û wê hebê.

ANSCHRIFT Bundespräsidialamt
11010 Berlin
TEL 030 2000-2021
FAX 030 1810200-2870
E-MAIL presse@bpra.bund.de
INTERNET www.bundespräsident.de